

# ZANYARÎYA JI BO NEXWEŞÎ Topiramát Actavis

Ji bo dermankirina atîyê

## ! Zanyarîya giring!

Eger tu ji ber van bijan bî, berêya bikaranîna Topiramát Actavis-ê bi dixtorê xwe re, karkerê dermanxaneyê re an hemşîreyê re têkilî bike:

- pirsên gurçikê, bi taybetî kevîrên gurçikê, tu di dîyalîza gurçikê de bî
- neasayîyên xwîynê avên laşî (jehribûna asîdê ya metabolîk)
- pirsên pişî

- pirsên giraniyê
- pirsên çavî, bi taybetî ava reş
- pirsên gihîştinê
- an eger tu di parêza rûnê zêde (dîyeta ketogenîk) de bî.

Di Topiramát Actavis 50 mg, 100 mg û 200 mg hebên bi tebeqede lecithin-lesîfîn (rûnê soyayê) heye. Eger ji fistiqên binê erdê an soyayê re alergîya te hebe vî dermanî bi kar neyne.

## Divê Topiramát Actavis çawa were bikaranîn

Her car Topiramát Actavis-ê bi şîreta dixtorê xwe bi kar bîne. Eger tu qenc nizanibî divê tu li şîreta dixtorê xwe an karkerê dermanxaneyê xwe bipirsî. Dermankirin di rewşa normal de bi doza kêm dest pê dîke derce bi derce bêtir dibe. Dibe ku ji bo xuyandina doza herî baş a ji bo te hinek zeman bivê. Hebên Topiramát Actavis-ê divên yekperçe werin daqurtandin. Tu car hebê perçe neke û hêj nexwe. Nebî nebî heban necûn ji ber ku ew karin çêjeka tehl bide devê mirovî. Heb, dibin berêya xwarinê di nava xwarinê de an jî piştî xwarinê werin daqurtandin. Dema ku te Topiramát Actavisê stand, ji bo nehiştina çêbûna kevîrên gurçikê di seranserê rojê de têr avîyan vexwin.



## Divê dermankirin çî qas zeman devam bike?

Dê dixtorê te biryar bide ka dê dermankirina te çî qas zeman devam bike. Gelek giring e ku tu bêyî têkilîkirina dixtorê xwe dermankirina xwe ranewestî. Ji nişka ve rawestandina dermankirina bi Topiramát Actavis dibe bibe sebebê xetera bêtirbûna çendîn felcan. Eger ku ji ber çî sebebê dermankirina te hat rawestandin, doz, wekî ku di rêçeteya ku te ji dixtorê xwe wergirtîye de jî hatiye xuyandin divê derce bi derce were kêmkirin.


## Eger ez/zarokê min em terkîba devkî ya Topiramát Actavis-ê zêde bistîndivê ez çî bikim?

Zû zûka şîreta medîkal bistîne. Pakêta dermanî bi xwe re

bibe. Dibe ku pirsên wek xewokîbûnê an westîne an tevgerên neasa yên laşî an pirsên li ser pêyan mayîne û bi rê ve çûnê, ji ber kêmasîya xwîynê yên gêjbûnê, lédana dilî ya neasa an hejîne werin serê te.

## Eger ez ji bîr bikim derman bistînim divê ez çî bikim?

Ji bo telafîkirina dozê tu dozên zêde nestîne. Eger te standina dermanê ji bîr kiribe ji dixtorê xwe bipirse ka divê tu çî bikî. Dirêjîya dema derbasbûyîna di ser doza te ya paşîn de gelek giring e.





# ZANYARÎYA JI BO NEXWEŞÎ Topiramát Actavis

Ji bo dermankirina atîyê

## Bandorên kêlekî yên gelek tên dîtin çî ne?

Wek dermanên din, ev derman jî dibe bibe sebebê bandorên kêlekî, lê her kesek mûheqqeq jê janê nakişîne. Bandorên kêlekî yên “gelekdtî” û jî 10 nexweşan bi 1î re dtî tevî lawazbûn, tevizîna milî û çîmê, tevizîn, xewokîbûn, gêjbûn, lihevketîna dilî, westîn û depresyon e.

Li ser bandorên kêlekî zanyarîya bêtir kare di reçeteya haydarkirina nexweşî ya di pakêtê de were dîtin.

## Gelo ez karim dermanên din bistînim?

Bandora terkîba devkî Topiramát Actavis-ê kare biguhere û standina te ya di yek zemanî de bikaranîna hin dermanên din dibe ku xetera bandora kêlekî bêtir kiribe. Lîsteya wan kare di reçeteya zanyarîya ji bo nexweşî ya di nava pakêtê de were dîtin.

Eger tu çî dermanên din distîni an te di nêz de standibe, her car jî dixtorê xwe re bêje. Di nava wan de dermanên bêreçete û yên Kurmancî jî hene.

## Ez karim biajonim?

Di dema dermankirina bi Topiramát Actavis-ê de dibe ku pirsên wek gêjbûnê, westînê û yên dtîne peyda bibin. Bêyî têkilîkirina bi dixtorê xwe re neajonin û alavan an mekîneyan bi rê ve nebin. Tevî vî awayî, divê di bîra te de be ku dema ku nexweşîna atîyê bi te re hebe jî bo ku destûra te ya ajotina ‘erebeyê hebe divê tu di seransera salekê te hîç bi atîyê neketîbî.



## Bihemlbûn û mijandin

Eger tu biheml bî an dimijîni, difikirî dibe ku tu biheml bî an jî difikirî bibî biheml, berêya bikaranîna dermanî li şîreta dixtorî an karkerê dermanxaneyê guhdarî bike. Dê dixtorê te biryara standin û nestandina Topiramát Actavis-ê bide. Bi muqayeseya dermanên din ên li dijî atîyê, jî aliyê standina Topiramát Actavis-ê ve li ser zarokê nebûyî yê di hemlê de xetera zirardîtinê heye. Qenc bizane ku te di dema hemlê de bi temamî xeter û feydeyên Topiramát Actavis-a li dijî atîyê fehm kiriyê.

Eger tu di dema standina Topiramát Actavis-ê de bimijîni, jî bo ku tiştekî neasa neyê serê bebeka te di demeka herî nêz de divê tu dixtorê xwe jî vî awayî haydar bikî.



.....

.....

.....

.....

## Gelo ez karim araqê vexwim?

Divê di vexwarina araqê de haya te ji te hebe, ji ber ku araq-alkol kare bandora Topiramát Actavis-ê xera bike. Bi dixtorê xwe re bide û bistîne.

